Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :982 | 26-Tîrmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/


Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

# Teknolojiya nû kifş kir ku pêkan e ku bi hêsirên çavan nexweşî bên naskirin

**Perçeyên mîkroskopîk yên di hêsiran de li ser tiştên ku di laş de diqewimin de agahiyan didin.**

Feî Lîû ku endezyarek bijîjkî li Zanîngeha Bijîşkî ya Wenzhoû ya li Çînê ye, dibêje: "Me xwest ku potansiyela bikaranîna hêsiran a ji bo tespîtkirina nexweşiyê nîşan bidin. Diyar bû ku ev yek pêkane, dilop dikare pencereyek ji zanyaran re veke ku li tevahiya laş binêrin."

Li gorî lêkolîna hatî kirin, mîna gilêza dev û mîzê, hêsir jî ji pirtikên piçûk ên bi peyamên hucreyî dagirtî ne.



Ger zanyar bikaribûna van peyamhilgirên mîkroskopî bişopînin, ew dikarin agahiyên nû li ser tiştên ku di hindurê laş de diqewimin pêşkêş bikin. Lê berhevkirina têra xwe ji van pirtikan ku jê re exozom têne gotin, zehmet e. Ji ber ku ya ji çavan diherike berevajî şilava ji parçeyên din ên laş e.

Ji ber vê yekê tîma Lîû ji bo ku pirtikên hêsiran bigirin rêyek nû peyda kirin. Li gorî wê destpêkê lêkolîner hêsirên beşdarên lêkolînê kom kirin. Piştre, tîmê hêsirên komkirî li amûrek bi du membranên nanoporoz zêde kir. Di nav çend kêliyan de, teknîka bi kar hatî dihêle ku molekulên piçûk xwe bidin paş û pirtikên ji bo analîzê bimînin.

Encaman çavdêriya zanyaran; tîmê dît ku cûreyên cuda yên nexweşiya çavên zuwa şopa xwe yên molekulî di hêsiran de dirijînin. Her wiha hêsir dikarin alîkariya bijîjkan bikin ku bişopînin bê ka şekirê nexweşekê çawa pêş dikeve.
Niha jî hevkarê lêkolînê Lûke Lee ku endezyarek bîoengîneer ê li Zanîngeha Bijîjkî ya Harvardê ye dibêje ku zanyar dixwazin ji bo delîlên nexweşiyên din û hem jî depresyon an stresa hestyarî hêsiran vekolin. Lee dibêje "Ev tenê destpêk e" û "Hêsir tiştekî ku me bi rastî lêkolîn nekiriye îfade dike." *ANF*

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Azwerî | Hirs, daxwaziya zêde. |
| Enflasyon (Fransî) | 1.Kêmbûna nirxê diravan ji ber giranbûna bihabûna tiştan. 2.Bênirxbûna tiştekî ji ber pirbikaranîna wî. 3.Bihabûn. |
| Kasa (Îtalî) | 1.Dolabên hesin yên ji bo parastina diravan û tiştên biqîmet. 2.Li ciyê ticaretxaneyan ciyê dayîn û standina diravan. |
| Keysbaz | Kesê ji rewşa heyî, yan rewşên awarte sûdê digire û ziyanê dide civakê. |
| Paye | Pile, derece, rutbe, meqam, statû: Leşkerekî payebilind |
| Pêşniyaz | Tişta ku yek dixwaze bê kirin. Pêşniyar, temenî. |
| Pîşe | Karê ku mirov ji bo wî hatiye perwerdekirin û ji bo debara xwe wî karî dike. Sinet: Pîşeyê filanî hesinkarî ye. |
| Qurnaz | Kesê hîleyan dike, kesê mirovan dixapîne. Fêlbaz, cambaz, hîleker, kone. |
| Tablo (Fransî) | 1.Nîgar, lewhe, dîmen, dîdar, wêneyê bi dest hatî çêkirin û hatî daleqandin 2. Agahiyên di nava rêz û stûnan de li ser kaxizê hatîn bicîkirin |
| Tûrîzm (Fransî) | Geştûgûzarî, geştvanî, geştyarî, gervanî, geştkirin. Kesê ji bo dîtina ciyan li welatê xwe yan derveyî welatê xwe digere. |

# Bi kilaman êşa dil didêre

**Kumru Babat ji wan kesan e ku li Kurdistanê êşa dilê xwe bi kilaman vedibêje.**

Kumru (Qumrî) ya ku dibêje, ew temenê xwe yê rast nizane, li gorî nasnameya xwe 60 salî ye. Qumrî li Cizîra Botan ji dayik bûye, û ev 40 sal in li navçeya Şirnexê Hezexê dimîne. Qumrî ji malbateke koçer e û heta 17 saliya xwe jî koçer bûye. Piştre dizewice û li Hezexê bi cîh dibe. Qumrî dibêje, dewleta Tirk gelek zilm li wna kiriye: "Em jiyanê derbas dikin. Lê tenê derbas dikin. Ji me re jiyaneke xweş û aram nehiştin. Jiyana me di bin tirs û zilmê de derbas dibe. Girtin heye, kuştin heye û şer heye. Em bi dilekî rehet nikarin razên. Avahiya me gelek caran hate gulê barandin. Lê dîsa jî em ji xaniyê xwe derketin."

**'Li dijî zilmê yekîtî divê'**

Qumrî dibêje, divê li dijî vê zilmê Kurd yekitiya xwe ava bikin: "Em Kurd jî tevî vê zilmê li xwe xwedî dernakevin. Em nabin yek û heta niha jî em di bin vê zilm û zordariyê de ne. Bi milyonan kurd hene. Lê li sazî û dezgehên dewletê zimanê me qedexe ye. Zimanê me nas nakin lê yê xwe li me ferz dikin."

**Kilamên nihurandina êşa xwe**

Qumrî dibêje, tevî vê zilmê jî têkoşîn û berxwedanek hatiye hûnandin û wiha pê de diçe: "Gava ku dayikan evqas êş û zilm dikişandin ji bo ku êşa wan sivik bibe, êşa xwe parve bikin, li ser zarokên xwe lorandin û kilam gotin. Bi vî awayî hinek jî be êşa xwe ji dilê xwe avêtine. Ez li ser êşa dilê xwe dibêjim. Li ser êşa ciwanên Kurdan dibêjim. Ên ku li ber xwe didin û têdikoşin tînim bîra xwe, li ser wan dibêjim."


Xwezî ciwan jî çandê biparêzin

Qumrî di heman demê de neqşan jî çêdike û ji bo ku ew kevneşopiya karên bi destan winda nebe, hewl dide:
"Berê jinan gelek karên destan çêdikirin. Çandekê me ya dewlemend heye. Lê mixabin niha tê windakirin. Gava ez vê rewşê dibînim, xemgîn dibim. Me tevn çêdikir, teşî dirêsa. Her wiha gelek amûrên me yên ji bo tevnê hene. Ez hê jî wan vedişêrim. Ew ji salên koçertiyê heta niha ligel min mane û hiltînim. Ez dixwazim ku heta ez sax bim bila bimînin. Min dixwest nifşê me yê nû jî wê çandê biparêze."
**JINNEWS/ŞIRNEX**

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | P | I | D | Î | ■ | A | L | Î | ■ |
| 2 | I | ■ | Î | S | A | L | ■ | C | A |
| 3 | S | A | K | O | ■ | A | D | A | R |
| 4 | ■ | A | ■ | T | E | N | Û | R | ■ |
| 5 | B | ■ | N | ■ | M | ■ | V | ■ | M |
| 6 | E | N | A | M | ■ | E | ■ | K | Î |
| 7 | G | A | ■ | E | R | J | E | N | K |
| 8 | ■ | M | A | T | ■ | N | ■ | K | A |
| 9 | H | E | B | ■ | K | Û | P | ■ | P |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 2 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 3 | ■ | | | ■ | | ■ | | | ■ |
| 4 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 5 | | ■ | | | ■ | | | | ■ |
| 6 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 7 | ■ | | | ■ | | | ■ | | |
| 8 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 9 | | | | ■ | | ■ | | | |

**ÇEP-RAST**

1. Birûmet, birêz... Xanedana qraliyeta Vîetnamê
2. Ji bo gotin û biwêjên taybet ku ji aliyê civat an jî kesên serserî ve tên bikaranîn... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê
3. Plakaya navneteweyî ya Tirkiyeyê... Eşîr, qebîle, hoz
4. Yezdanekî misrî... Sedemkarê tevgerê, paldêr... Kurtebêja Zîvê
5. Rêxistina polîsan a naziyan... Remil
6. Şêra mê
7. Daçekek ku wateyê xurt dike... Cureyekî xwînê... Daçekek
8. Rojek... Danekî rojê
9. Boçik, dêl... Temen

**JOR-JÊR**

1. Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin... Dijberê rengî spî... Cejn, eyd
2. Nexweşiyek... Çong
3. Lawaz... Rengek
4. Agir... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin
5. Hişaloz, bêhişê ku wekî sermestan tevdigere... Dua, niyaz
6. Sendîkaya Karkeran a Swêdê... Baneşana bêhntengiyê... Tevgera hewayê
7. Vexwarina sereke... Notayek
8. Helale, lale
9. Notayek... Fikr û raman



# HPG: Ji bo tolhildana komkujiya Zaxoyê çalakî hatin lidarxistin

Gerîlayên Azadiya Kurdistanê ji bo tolhildana komkujiya ku dewleta Tirk a dagirker li Zaxo pêk anîbû çalakî li dar xistin. Di çalakiyan de 4 dagirker hatin cezakirin, 2 çeper, dronek û kamerayek mobesse hatin rûxandin, wesayîtek zirxî jî hate derbkirin. ***R-3***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 982 | 26-Tîrmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# KOALÎSYONA NAVNETEWEYÎ BERPIRSYARÊ ŞEHADETA FERMANDARÊN YPJ'Ê YE



Dirûtiya Koalisyona Navneteweyî ji her kesî re eşkere bûye, li aliyekî desteke dide dewleta tirkî ya dagîrker ku êrişî fermandarên ku çeteyên DAIŞ'ê têkbirine bike û li aliyê din jî sersaxiyê ji bo van fermandarên YPJ'ê ku di êrişên dewleta tirkî ya faşîst de şehîd bûne, dixwaz e.

## Şervanên YPJ`ê: Em ji bo her rewşê amade ne



Şervanên Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) dan zanîn ku wek hêza jin ew ji bo her rewşê amade ne. Herwiha bang li tevayiya jinan kirin ku tevlî refên têkoşîn û şoreşê bibin û xwe ji tevayiya cûreyên desthilatdarî û dagirkeriyê rizgar bikin. ***R-2***

## Jiyan, Roj, Baharîn û Azadî

Xirabiya dewleta tirkî dewam dike. Dixebite ku her tişta bedew tine bike. Dema bibe mijara Kurdan zimanê wê tev li ser şidet, tinekirin û bêbandorkirinê ye. Dijminiyeke kûr û bîsînor dike. ***R-5***

## Dewleta Tirk Ya Dagirker Mesrur Barzani Erkdar Kir!

Li gor agahiyên ku ajansa rojnews dest xistîn, Serokê hikûmeta Herêma başurê Kurdistanê Mesrûr Barzanî bi armanca kêmkirina nerazîbûnên Iraqê li dijî dewleta Tirk û her wiha ji bo lihevkirinek veşarti, li ser daxwaza dewleta Tirk serdana Bexda'yê kiriye. ***R-5***

## Atolyeya Şehîd Delîla: Fêrgeha hûnerî ya zarokên Mexmûrê



Atolyeya Şehîd Delîla ya Wargeha Mexmûrê 18 sal in tevî şert û mercên zehmet û bêderfetiyan bênavber xebats xwe ys çand û huner dimeşîne. Hevberdevka Atolyeyê Hêvî Bûldan dibêje; "Tenê armanca me parastina çanda Kurdî û perwerdekirina ciwanan e.' ***R-7***

## Evîn Cûma: Ji ber êrîşan koçber zehmetiyan dikişînin

Rêvebera Komeleya Mafên Mirovan ya Herêma Cizîrê Evîn Cûma, têkildarî geşedanên rewşa şer û êrîşên dewleta tirkî yên ser herêmê û bandora wan li koçberan nirxandin. ***R-6***

**Islam aştiyê dikuje yan Misilman dikujin?**



Hafiz Ahmet Turhalli ***R-6***

**Nikarin rastiyê berûvajî bikin**



Dilyar Cizîrî ***R-4***

**Peymana kuştina Kurdan: Lozan, 24'ê Tîrmehê 1923**



Sîpan Şînda ***R-7***

# Şervanên YPJ`ê: Em ji bo her rewşê amade ne

Şervanên Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) dan zanîn ku wek hêza jin ew ji bo her rewşê amade ne. Herwiha bang li tevayiya jinan kirin ku tevlî refên têkoşîn û şoreşê bibin û xwe ji tevayiya cûreyên desthilatdarî û dagirkeriyê rizgar bikin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Ji bo parastina nirx û mîrasa gelê bakur û rojhilatê Sûriyê, herwiha Azadî û parastina Jinê 4`ê Nîsana 2013’a Yekîneyên Parastina Jin(YPJ) hat damezrandin. Ev hêz weke hêzeke xweser tevdigere. Di nava vê hêzê de jinên rojavayê Kurdistanê yên Kurd, Ereb, Sûryan, Tirkmen, Aşûr û Ermen cih digrin û li hember tevayiya êrişên ji derveyî parastina welat erka xwe ya bingehîn pêk tînin û berjewendiyên gelên Rojava diparêzin. Ev hêz di demek kin de serdestiya xwe ya leşkerî li seranserê Rojava îsbat kir û Piraniya bajarên bakur û rojhilatê Sûriyê ji destê rejima Bais ya desthilatdar azad kir. Herwiha li dijî êrîşên çeteyên DAIŞ`ê berxwedaniyeke bêhempa meşand û di avakirin û parastina herêmekî ewle de roleke dîrokî lîst. Ji destpêka damezirandinê û heta niha gelek şer û berxwedaniyên dîrokî birêve birine û li gor qanûnên Xweseriya Demokratîk erka xwe ya parastinê berdewam dike. Niha jî li dijî gef û êrişên dagîrkeriya Tirk disekine û parastina ax û destkeftiyên şoreşê yên ku bi saya şehîdan hatine bidestxistin dike.

Dewleta Tirk ya dagirker bi armanca têkbirina şoreşê û binketina pêşengên wê yên jin , heta roja îro hewl dide projeya qirkirina gelê kurd bi ser bixîne. Herwiha bi hedefgirtina şoreşê re dixwaze hêza jinên pêşeng ji holê rake. Têkildarî gef û êrişên dewleta Tirk ya dagirker yên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, herwiha rola Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) di parastina herêmê de, jinên berxwedêr yên ku di nava hêzên YPJ`ê de cih digrin ji me re axivîn û piştgirî û helwesta xwe diyar kirin.



**`Li hember êrişan emê hêz û berxwedaniya xwe xurttir bikin`**

Şervana Yekîneyên parastina Jin (YPJ) Sozdar Birîn ku ji destpêka şoreşa Rojava ve di nava hêzên YPJ`ê de cih girtiye û erka xwe ya parastina pêk tîne wiha axivî: “Îro em di navenda şerê cîhanê yê sêyemîn de cihê xwe digrin û wek hêzeke jin rola xwe dilîzin. Herwiha got, wek şervan û jinên YPJ`ê Ji bo em karibin herêma xwe ji dagirkeriyê biparêzin û yekbûneke xurt bi tevahî jinên Rojhilata navîn û cîhanê re ava bikin pêdiviya me bi xwe parastinê heye. Parastina li dijî pergala modernîteya kapîtalîst û hêzên dagirker jî ancax bi stratejiya şerê gelê şoreşgerî re pêk were. Çimkî li hemberî me dijminekî ku hewl dide me bixe nava pençên xwe yên qirkirinê heye. Li hember wê jî emê hêz û berxwedaniya xwe xurttir bikin û bersiva van êrîşan bidin.”

**`Ew çiqas êriş bikin emê zêdetir xurt bibin`**

Sozdar Birîn da zanîn ku heta roja îro jî êrîş û planên dagirkeriyê li ser herêma wa berdewam dikin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Rojane bi dehan êrîş û konseptên nijadperestiyê pêk tên. Dagirkeran destdirêjî mêjî û bedena jinan dikin, xaka me talan dikin û gelê me di komkujiyan re derbas dikin. Her wiha bi gelek rêbazên cûda êrîşên xwe yên hewayî li ser xaka me, li ser çeperên şervanên me didin meşandin. Lê ew çiqas êrîş bikin jî, emê zêdetir xurt bibin û bi her awayî hewldanên dagirkeriyê têk bibin. Her şervaneke YPJ`ê di roja îro de bi fedayî û wêrekiyeke mezin li dijî êrîşên dagirkeriyê tekoşîna azadiyê dide meşandin. Çimkî em jinên YPJ di her rewşê de û tevî zor û zehmetiyan li ber xwe didin û emê li ber xwe bidin jî. Em ji bo her rewşê amade ne. Herwiha got, me hêza xwe ji şehîdên xwe girtiye. Şehîdên me rêya tekoşîn û rastiyê nîşanî me dane.”

Şervana Yekîneyên parastina Jin (YPJ) Sozdar Birîn di dawiya axaftina xwe de bang li tevayiya jinan kir ku tevlî refên têkoşîn û şoreşê bibin û xwe ji tevayiya cûreyên desthilatdarî û dagirkeriyê rizgar bikin.



**`Pêwîstî bi hêza Gelê Şoreşger heye`**

Şervana bi navê Alaa Zagros jî got, ji bo ku em dagîrkeran têk bibin û parastina nirxên şoreşê bikin, pêwîstî bi hêzeke mezin ya gel heye û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Wek hêzeke jinê ya parastinê em erka xwe pêk tînin. Lê di vê rewşê de hêza me tenê têrê nakê, pêwîstî bi hêza Gelê Şoreşger heye, da ku em û gel bi hev re dawî li dagîrkeriyê bînin. Eger gel li kêleka me parastinê neke, wê rewş ber bi xirabûnê ve biçe. Hêza me bi hêza gelê me temam dibe. Çawa ku masî bê av nikarin bijîn, em jî bê gelê xwe nikarin bijîn.”



**`Emê dagîrkeriyê bi dawî bikin`**

Alaa Zagros di dawiyê de got, Erkê me ye em welatê xwe biparêzin, heta ku em dagîrkeriyê ji xaka xwe dûr bixin. Ji bo her rewşeke awarte jî, em bi fikrî, ruhî û fîzîkî amade ne. Wek jin çawa ku me fikrê desthilatdar şikand û pêşî lê girt, emê dagîrkerî jî bi dawî bikin.

# Foruma Şoreşa Jinan bîryarên girîng bi dawî bû

**Foruma yekê ya Şoreşa Jinan li ser asta Rojhilata Navî bi biryarên girîng têkildarî xurtkirina têkoşîna jinan di nava Şoreşa 19’ê Tîrmehê de û pêşxistina hevgirtina jinan bi soza pêkanîna hevalên xwe yên ku ji aliyê dawleta dagirker ve hatine hedefgirtin, bi dawî bû.**

Foruma yekemîn a Şoreşa Jinan li ser asta Rojhilata Navîn 22’ê Tîrmehê bi diruşma **“Bi hevgirtina jinan em ê destkftiyên şoreşê biparêzin û pêş bixin”** li Hola Zanîngeha Rojava ya li bajarê Qamişlo dest pê kir. Forum ku bi boneya deh sahiya Şoreşa 19’ê Tîrmehê hat lidarxistin, du rojan dewam kir.

Forum bi biryarên girîng têkildarî hevgirtin û pêşxistina têkoşîna jinan di hemû qadan de bi dawî bû. Herwiha di encamnamê de hat ragihandin ku ev forme ji bo giyanê şehîd Jiyan Tolhildan, Roj Xabûr û Barîn Botan hat diyarîkirin û soza şopandina rêya wan hat dayîn.

Encamnameya forumê bi zimanên kurdî û erebî ji aliyê endama Yekitiya Jinên Suryan Îlham Mitlî û endama Komîteya Têkiliyan a Kongra Star Pencewîn Elî ve hate xwendin.

**Encamname wiha ye:**

‘’Foruma Şoreşa Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê 22 û 23’ê Tîrmeha 2022’an li bajarê Qamişlo li dar ket. Ji tevahî pêkhateyên Sûriyê 200 jin beşdar bûn. Her wiha gelek jinên ji Rojhilata Navîn û dewletên cuda bi rêya bernameya zoomê beşdarî foruma jinan bûn.
Jin û rêxistinên jinan ên li Rojhilata Navîn, Amerîka û Ewropayê peyamên pîrozbahiyê ji bo forumê şandin û hêviya serekftinê jê re xwestin.

Forum bi boneya deh saliya Şoreşa 19’ê Tîrmehê ji aliyê 7 rêxistinên jinan; Kongra Star, Akademiya Jineolojî, YPJ, Kombûna Jinan a Zenûbiya, Meclisa Jinan a Sûriyê, Yekitiya Jinên Suryan û Meclisa Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve hat organîzekirin.
Armanca sereke ya vê forumê nirxandina pêvajoyên şoreşa jinan û encamên ku bi xwe re anîn e. Her wiha da ku perespektîvên têkoşîna parastina şoreşa jinan û pêşxistina wan werin dayîn.
Di vê çarçoveyê de gelek mijarên wekî encamên têkoşîna 10 salan a şoreşê, êrişên li ser şoreş û berxwedana jinan û bandora şoreşê li ser xeta têkoşîna jinan li Kurdistanê, Sûriyê, Rojhilata Navîn û cîhanê bi awayekî berfireh hatin nîqaşkirin.
Fermandara YPJ û QSD’ê û YAT’ê Jiyan Tohildan û du fermandarên din ên YPJ’ê Roj Xabûr û endama YAT’ê Barîn Botan piştî ji forumê vegeriyan, li hemberî wan êrişeke hovane ji aliyê dewleta Tirk a faşîst ve hatin hedefkirin û şehîd bûn.
Em vê êrişê bi tundî şermezar dikin û vê forumê diyarî giyanê şehîd Jiyan Tolhildan, Roj Xabûr û Barîn Botan dikin û soza şopandina têkoşîna wan ya azadiya jinan, parastina hêza xweser û cewherî ya jinan didin.

**Li ser bingehê nîqaşên çêbûyîn ji bo parastin û pêşxistina şoreşa jinan em gihîştin encamên girîng:**

1. Di 10 salên şoreşê de gavên dîrokî hatin avêtin û ji bo tevahî jinan destgeftiyên mezin hatin afirandin. Ev destkeftiyên şoreşa jinan ji bo tevahî cîhanê bûn hêvî. Ji bo mezinkirin û mayîndekirina vê şoreşê di foruma me de biryara bilindkirina têkoşînê hat girtin.
2. Şoreşa jinan bi êrişên tund re rû bi rû ye û hê jî hemû armancên xwe pêk neaniye. Ji bo mîsogerkirina şoreşê pêwîst e em destkeftiyên wê her dem zêde bikin û bikin malê hemû jinan.

3. Qanûnên jinan wek destkeftiyeke sereke ya şoreşê hat nirxandin. Ji bo pêkanîna qanûnên jinan divê ku di asta Sûriyeyê de têkoşîn bê meşandin û xurtkirin.

4. Di asta Sûriyeyê de kombûnek wiha ya jinan pêkanîn bi xwe serkeftineke mezin e lê di heman demê de girîngiya pêşxistina tifaqên demokratîk ên jinan dide ber çav. Pêwîst e em hevgirtina jinan di asta Sûriyeyê de hîn bêhtir xurt bikin.

5. Bi zanebûna ku şoreşa jinan berî her tiştî şoreşeke hişmendî ye em biryara bilindkirina têkoşîna hişmendiya azadiyê didin.
6. Rizgarkirina hemû jinan ji dagirkerî, esaret û ji zindanan erka




me ya sereke ye. Bi vê armancê em ê têkoşîna xwe bilind bikin. Bi taybetî ji bo ku bajarên wek Efrîn, Bab, Cerablûs, Ezaz, Idlib, Serêkaniyê û Girê Spî yên ku di bin dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê de ne bên rizgarkirin divê em têkoşîna xwe xurtir bikin.
7.Êrîşên qirkirinê herî zêde li ser jinan tên meşandin. Divê jin li hemberî hemû cureyên êrîşê ku ji aliyê hêzên dagirker û hişmendiya zilamperest ve pêk tên xwedî hêza xweparastinê bin û divê jinek jî bê parastin nemîne.

8. Bi zanebûna ku çareseriyeke demokratîk û mayînde bê îradeya jinan ne gengaz e divê beşdarbûna jinan di biryarên siyasî de bê mîsogerkirin û mafên jinan bi nêrîna jinan di destûra Sûriyeya pêşerojê de cih bigrin.
**ANHA**



# Atolyeya Şehîd Delîla: Fêrgeha hûnerî ya zarokên Mexmûrê

Atolyeya Şehîd Delîla ya Wargeha Mexmûrê 18 sal in tevî şert û mercên zehmet û bêderfetiyan bênavber xebats xwe ys çand û huner dimeşîne. Hevberdevka Atolyeyê Hêvî Bûldan dibêje; “Tenê armanca me parastina çanda Kurdî û perwerdekirina ciwanan e.’

Li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) ji 2004’an ve, ango 18 sal beriya niha ji aliyê komek ciwanên wargehê ve ji bo zarok, xwendevan û ciwanên wargehê atolyeyek a hunerî ya bi navê ‘Atolyeya Şehîd Delîla’ hat vekirin. Di nava van 18 salan de bi sedan zarok û ciwanên wargehê ruxmê hemû êriş û bê derfetiyan jî xwe fêrî xêzkirina wêneyan kirine û êşên civaka xwe bi xêzkirina tabloyan zindî hiştine.

Atolyeya Şehîd Delîla girêdayî Wexfa Jinan a Wargeha Mexmûrê ye. Her du heftiyan carekê bi fermî tekmîlên xwe digirin û civînên xwe li dardixin. Di tekmîl û cîvînên xwe de pirsgirêkên heyî nîqaş dikin, çareserî avadikin û li gor wê xebatên xwe didin meşandin. Her wiha ji aliyê Atolyeyê ve, di her betlaneya dibistanan de dewreyên perwerdê tên li darxistin û bi sedan zarok û ciwanan ji bo pêşerojê tên perwerde kirin. Her wiha her sal ji bo rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, di 4’ê Nîsanê de pêşengehekî vedikin û bi sedan berhemên çand û hunerî di wê pêşengehê de tên pêşkêşkirin. Pêşengeha 4’ê Nîsanê êdî bûye çandek ya wargehê û beriya 4’ê Nîsanê amedekariyên mezin ji bo pêşengehê tên kirin.

Bi sedan ciwanên wargehê xwe di atolyeyê de pêşxistine û mirov dikare bêje hindek ciwanan zaroktiya xwe di vê Atolyeyê de derbaz kirine. Hevberdevka Atolyeya Şehîd Delîla, Hêvî Bûldan yek ji wan kesane ye ku ev 10 salin ji zaroktiya xwe ve bê navber di atolyeyê de xwe pêş dixe û zarokan perwerde dike.

**‘Şûna ku bi telefonan re mijûl bibin, tên gel me xwe fêrî hunerê dikin’**

Hevberdevka atolyeyê Hêvî Bûldan têkildarî xebatên atolyeyê ji rojnama Rojev a Mexmûrê re axivî û anî ziman ku ew hem perwerde dibînin û hem jî perwerde dikin û got: “Ji vekirina atolyeyê heta niha kesên ku dibistana xwe diqedînin û dixwazin pêşbikevin, tên vir perwerde dibînin û perwerde didin zarokan. Armanca me ji vê xebatê ewe ku ti kes hunera xwe di hindirê xwe de veşartî nehêle û hestên xwe birijînin ser rupelên spî. Em wek endamên atolye di her betlaneya salane ya dibistanan de, dewreyên perwerdê didin destpêkirin û gelek zarok tevlî perwerdeyê dibin. Li şûna ku zarok bi telefon û





înternetê re mijûl bibin, tên gel me û xwe fêrî hunerê dikin. Ya rast, dikevin wê ferqê ku hunerek a wan heye. Xêzkirina pênûsa reş û tabloyan gelek bala zarokan dikişe.”

**Li gor pergala KCK’ê xebat dikin**

Hêvî Bûldan ferqa di navbera pergala ku ew têde dijîn û ya dewletê bibîrxist û diyar kir ku li her derê cîhanê perwerdeyên hunerî bi pere tê kirin, lê li wargehê tiştek wisa nîne û wiha pêde çû: “Em hemû bê beramber dewreyên perwerdeyan didin destpêkirin. Heta niha bi sedan zarok û ciwanên wargehê cewhera xwe ya hunerî naskiriye. Atolyeya Şehîd Delîla li gor sîstema KCK’ê bi rê ve diçe. Em girêdayî Wexfa Jinên Wargehê ne û her du heftiyê carekî em tekmîla xwe didin Wexfê. Her wiha em bi kombûn, tekmîl û civînan pirsgirêkên xwe çareser dikin.”

**‘Pêşengeha 4’ê Nîsanê bûye çandek’**

Her wiha Bûldan qala rojên taybet, wek 4’ê Nîsanê kir û diyar kir ku Atolyeya Şehîd Delîla her sal pêşengehek a 4’ê Nîsanê li vedike û wiha peyîvî: “Pêşengeha 4’ê Nîsanê êdî bûye çandek ya wargehê. Em ji bo 4’ê Nîsanê di destpêkê de li dibistanan pêşbirkek a hunerê didin destpêkirin û li gor wê berheman ji didin komkirin. Her wiha em jî beriya 4’ê Nîsanê xebatek hevbeş û mezin didin pêkanîn û wêneyên Rêber Apo, şehîdan, jinên têkoşer, xweza û bi giştî rastiya Kurdewarî didin xêzkirin.”

**‘Ji modern zêdetir civakî ne’**

Hêvî anî ziman ku ew di hunera xwe de rastiya civaka Kurd xêz dikin û ev mînak da: “Di 4’ê Nîsanê de ji aliyê xwendevanekî ve tabloyek hatibû çêkirin û gelek bala civaka me kişandibû. Ji ber ku di tabloya xwe de êrişa dewleta Tirk a li ser wargehê xêz kiribû. Her wiha çand û hunera jinê, êş û azarên jinê kişandî tên xêzkirin. Heman demê de di piraniya berheman de êş û azarên civakê tên rijandina ser rupelan. Ji tabloyên modern zêdetir, em rastiya civaka xwe xêz dikin. Beriya rêgiriya li ser wargehê, me gelek pêşengeh li Hewlêr, Silêmanî û cihên din vedikirin. Her wiha berhemên me diçûn ji derveyî welat û li wan deran rastî eleqederiyek mezin dihat. Lê piştî rêgiriyê me ne karî em xebatên xwe wisa bidin ji derve. Lê ev rêgirî ji me re nebûye asteng û nabe asteng jî. Yek armanca me heye, fêrkirin û parastina çandê ye. Ji bo vê çi bibe bila bibe, emê xebatên xwe bidin berdewam kirin.”

**‘Emê heta dawî xwedî li destkeftiyên civaka xwe derbikevin’**

Herî dawî Hevberdevka Atolyeya Şehîd Delîla, Hêvî Bûldan da zanîn ku berhemên tên firotin dibe dahata atolyeyê û wiha axaftina xwe domand: “Sîstema me ne wek sîstemên din takekesiye, li gel me bi hev re xebat meşandin heye. Em komek ciwanên wareghê ne, di hêla madî û manewî de em bi hev re dibin alîkar. Dahatek an jî alîkariyek ji me re ji derve nayê. Em girêdayî Meclîsên xwe ne û li gor wê di nava hemahengiyekî de xwe didin rêvebirin. Mirov dikare bi rêya hunerê çanda Kurdî biparêze. Ji bo wê ez bang li ciwan û bi taybetî civaka Kurd dikim, ji bo çandek rast û parastî, xwedî li hunera Kurdî derbikevin û cewherê xwe nas bikin. Her wiha çanda xwe bidin fêrkirin û xwedî lê derbikevin. Wek Atolyeya Şehîd Delîla jî emê heta dawî ji bo civaka xwe têkoşîn bikin û xwedî li destkeftiyên civaka xwe derbikevin.”
***ROJNEWS***



**Peymana kuştina Kurdan: Lozan, 24’ê Tîrmehê 1923**

Sîpan Şînda

Di şerê cîhanê yê yekê de dewleta Osmanî ya 600 salan desthilatdarî kirî têk diçe. Bêguman ev desthilatdariya 600 salan dom kirî ne hema welê bi hêsanî xwe li ser piyan girtiye. Xwîna bi milyonan feqîr û jaran hatiye rijandin, mal hatine talankirin û wêrankirin, ocax hatine korkirin, dewlet hatine hilweşandin, zilm û zor li xelkê hatiye kirin û hwd. Lê di despêka sedsala 20’an de şerê cîhanê yê yekê dest pê dike û ev dewleta zordar û mêtînger di vî şerî de tê hilweşandin.

Piştî têkçûna dewleta Osmanî ya di şerê cîhanê de, ji neteweyên di binê mêtîngeriya wan de hema hema hemûyan mafê xwe yê serxwebûnê standine ji bilî Kurdan. Piştî şer dewletên dinyayê li hev rûdinin û konferanseke mezin li bajarê Swîsre Lozanê pêk tînin. 24’ê Tîrmeha 1923’yan ev peymana malkambax di navbera dewletên di şerê cîhanê de serketî (Brîtanya, Frense, Îtalya, Yewnan, Japonya) û nûnerên Tirkan de hatiye destnîşankirin. Ya rast van dewletên mêtînger jixwe Kurdistan di peymana Sykes-Pickotê de (1916) kiribûn çend qet û li xwe par ve kiribûn. Herwiha dîsa di peymana Sewrê de (10’ê Tebaxa 1920’an) Kurdistan kiribûn qet lêbelê dîsa ji li gorî vê peymanê Kurdistaneke kiçik ava kiribûn. Mixabin di peymana Lozanê de gelek lîstok tên lîstin û Kurd li wir ji nedîtî ve têne û ti mafê wan nayê naskirin. Ji maf naskirinê wêde, ew dewletên ku di wê konferansê de amade bûne û peyman destnîşankirine, di heman demê de fermana Kurdan destnîşan kirine. Destnîşankirina wan ya li binê wê peymanê, ji bo Kurdan êdî destpêkeke nû bû. Xiyaneteke mezin li wan hatibû kirin û welatê wan ji aliyê dinyayê ve di nava çar dewletan de hatibû parvekirin. Ev destnîşankirin di heman demê de destûrdayîna kuştina Kurdan bû. Wan dewletên ew peyman destnîşan kirîn di heman demê de soza xwe dabûn çar dewletan ku çi bînin serê Kurdan wê dengê xwe nekine û heta wê piştgiriya wan jî bikin. Nûnerên dewleta tirkî ya nû bi awayekî serketî vegeriyabûn û wan dizanî êdî dikarin her tiştî bînin serê Kurdan û wê ti kes jî dengê xwe neke. Ew bûbûn dewlet û xiyanet li Kurdan hatibû kirin. Ew biratiya ku di çeperen şerî de li ser devê wan bû tişteke din û êdî bira bûbûn neyar, xayîn, eşqiya û terorîst. Ew yan birayên ku tenê di “tengiyê” de dihat bîra wan li wir ji piştê ve dabûn ber xenceran û dil û hinavê wan peritandibûn û biratî li wir binax kiribûn. Mane ew gihabûn mexseda xwe û êdî çi bira jî ji wan re ne lazim bûn.

Belê piştî vê peymanê jiyana Kurdan jî têguhertin û dikevine qonaxeke nû. Kurd ji vê peymanê qet razî nebûne û êdî dest bi karûbarê şerê azadiyê dikine. Ji her alî ve dikevine nava tevvgerê û li her çar parçeyên Kurdistanê zana, alim, serokeşîr û rêberên Kurdan dikevin nava bizavê û li riyên yekîtiyê, rêxistinbûnê û azadiyê digerin. Serhildan dest pê dikin, lê mixabin dijminê ku di rojên tengiyê de digot “bira” xedar û bêinsaf e û ti rehm di dilê wî de nîne. Çi li Bakur, çi li Başûr, çi li Rojhilat û çi li Rojava êdî qirkirina Kurdan bi awayekî dijwar dest pê dike û mixabin hê jî didome.

# Evîn Cûma: Ji ber êrîşan koçber zehmetiyan dikişînin

Rêvebera Komeleya Mafên Mirovan ya Herêma Cizîrê Evîn Cûma, têkildarî geşedanên rewşa şer û êrîşên dewleta tirkî yên ser herêmê û bandora wan li koçberan nirxandin.

Dewleta tirkî a dagirker ev demeke bi gef û êrîşên xwe ewlehiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tehdît dike. Dewleta tirk vê carê herêmên weke Til Rifet û Minbicê kirine hedefa êrîşên xwe tevî ku berî wê jî herêmên weke Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir kiriye hewl dide cihên din jî dagir bike.

Herêmên ku niha dewleta tirk kirine hedefa êrîşa xwe piranî koçberên Efrînê lê bi cih dibin û li hember zehmetiyan li ber xwe didin. Dewleta tirk bi van êrîşan dixwaze van koçberên ku bi zorê ji axa xwe hatine koçberkirin careke din mecbûrî koçberiyê bike û herêmên nû tevli nexşeriya dagirkeriya xwe bike. Têkildarî mijarê Rêvebera Komeleya Mafên Mirovan a Herêma Cizîrê Evîn Cûma bandora gef û êrîşên dewleta tirk li ser koçberan nirxand.

**“Êrîşên dewleta tirkî xetereke mezin li ser jiyana koçberan çêdikin”**

Evîn Cûma behsa zehmetiyên koçberiyê û xeteriya êrîşên dewleta tirk li ser koçberan kir û wiha dest bi nirxandina xwe kir: “Ev demek e dewleta tirk û çekdarên muxalefeta Sûriyeyê li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gefên xwe berdewam dikin. Encamên van êrîşan û bandorên wê yên neyînî li herêmên dagirkirî weke Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî baş hatin xuyakirin ku koçberiyeke bi zorê li herêmê bi xwe re anî. Ew mirovên koçber jiyana pir zor derbas dikin û taybetî li Sûriyeyê ev zêdetirî 10 salan e krîzeke şer hat jiyîn van hemûyan hiştin ku mirov bi zehmetiyan re rû bi rû bimînin.

Bi berdewamiya van êrîşan re gel ketiye rewşeke pir zehmet, hem ji aliyê derûnî ve hem jî ji aliyê debara jiyanê ve bi taybetî di hundirê kampên koçberan de. Em dibînin li herêma şehba û Til Rifetê gelê Efrînê yê xwe li wir bi cih kiryne bi hêviyên vegerê dijîn lê li aliyê din jî gihandina alîkariyeke mirovî ji wan re pir zehmet e. Heya niha ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve weke kampên koçberan fermî nehatine dîtin û alîkarî ji wan re nayê pêşkêşkirin. Ev koçberî gelek zehmetiyan di aliyê tenduristiyê de jî bi xwe re tîne. Kampên koçberan ên li herêmê li aliyê Cizîrê, Reqa û Minbicê, jî tu alîkarî ji wan re nayê pêşkêşkirin. Kampên din weke kampa Roj û Hol kesên tê de malbatên DAIŞ’ê ne û xetereke mezin li ser herêmê didin çêkirin her wiha êrîşên heyî fersendê didin wan ku ji nû ve xwe zindî bikin û şerekî mezin li herêmê derbixin.”

**“Dewleta tirkî ji bo ku nekeve binê zexta zagonên navneteweyî hewl dide herêmê vala bike”**

Evîn Cûma bal kişand ser binpêkirina zagonên navdewletî ji aliyê dewleta tirk ve yên têkildarî parastina mafên koçberan û wiha domand: “Gelê me li Til Rifetê bûye mînakên berxwedaniyê yanî çend kîlometeran dûrî axa xwe ne lê ewqas girêdana wan xurt e. Tevî xeteriyên heyî ew dest ji axa xwe bernadin û ev yek îradeya gelekî welatparêz dide xuyakirin. Girêdana vî gelî bi axê re ji dijminan re pir zehmetiyan di aliyê qanûnî û raya giştî de dide çêkirin. Li gor tfaqa mafên koçberan kesên ku bi darê zorê ji cihên xwe koçber bûne pêwîst e bên parastin.

Dewleta tirk ji bo nekeve bin zexta zagonên navneteweyî her û her hewl dide herêmê vala bike. Dewleta tirk dixwaze projeya xwe ya din li ser rûyê erdê pêk bîne û guhertineke demografîk li herêmê çêbike. Kesên ku koçberî Tirkiyeyê bûne dewleta tirk dixwaze wan jî bi darê zorê bîne li herêmê bi cih bike û gelê resen ji ser axa wê bide koçberkirin. Li aliyê din jî anîna koçberan ji Tirkiyeyê û bicihkirina wan li şûna gelê resen dihêle nakokiyên mezin di navbera gelan de derkevin pêş û şerekî demdirêj di navbera Sûriyeyan de derbikeve holê. Pê re jî wê cudakarî, kîn û şerê navxweyî derbikeve pêş.



**“Pêwîst e rê li ber êrîşên li ser koçberan bê girtin”**

Evîn Cûma bang li rêxistinên mirovî û aliyên pêwendîdar kir ku bi erka xwe rabin der barê parastina koçberan de ji êrîş û şeran û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Weke Komeleya Mafên mirovan banga me ji hemû rêxistin û aliyên pêwendîdar re heye ku bi erk û berpirsyariya xwe rabin da ev koçbriya bi darê zorê bê rawestandin û êdî mirov li ser axa xwe bi ewle bijîn. Ji ber ku ger rewş bi vî awayî berdewam bike wê pir encamên xerab bi xwe re bîne wê gel xwe bi xwe hev qebûl neke. “

***JINHA***

## Islam aştiyê dikuje yan Misilman dikujin?



Hafiz Ahmet Turhalli

Ez bi navê Xwedayê ku çavkaniya merhemet û heskirinê ye we tevayiya xwendevanên Rojnameya Ronahî silav dikim. Ez hêvîdarim ku em bikarin ji hev li ser zanebûna heqîqetê sûdê bigirin. Islam gotineke Erebî ye; lê mixabin wateya wê di nava civaka Misilman de, bi awayekî seresere tê nirxandin û şaş tê şîrovekirin. Jimara me Misilmanan li cîhanê di ser milyar û nîvê re ye. Pirs ev e: Gelo, ev mirov wateya peyva ‘ol’ê ku jê bawer dikin, dizanin yan na? Misilmanên ne Ereb bi zimanê Erebî nizanin, lê kesên bi nijada xwe Ereb jî, wateya Ola Islamê weke ji deshilatên ku ser hezar salî re li ser wan deshilatdariyê dikin bîhîstine yan şîrove kirine, dizanin.

Islam: Ji koka gotina SILM e. Wateya wê di Qur’ana pîroz de, di Sûreyê Beqere ayeta 28’an de hatiye eşkerekirin. Di vê ayetê de zimanzanên Ereb tev bê nîqaş û gengeşeyan wek aştî ev têgîn şîrove kirine. ‘Gelî bawermendan hemû bi hev re bikevin nava aştiyê’. (Beqere 208) Ji vê wateyê tê zanînê ku Islam bê Nîqaş wateya wê ya bingehî AŞTÎ ye.

Di Qur’ana pîroz de weke nav 28 caran hatiye dubarekirin, wek kiryar 112 caran bi tevayî 140 caran hatiye bikaranîn. ‘Min navê Ola we Islam lê kir’. (Maîde 3) Xwedê navê ‘Olê’ Islam lê kiriye .

Xwedê, Islam wek projeyeke aştiyê ji bo mirovayiyê şandiye. Aştî navbera Xweda û mirovî de, Aştî di navbera mirov û mirovî de, aştî di navbera xweza û mirovî de. Di wê serdemê de, Ereban hev dikuşt û ev kuştina mirovan wek pesindayîn pênase dikirin. Kesên kujer wek qehreman û egîdan dihatin dîtin. Li ser navê wan helbest dihatin çêkirin û bi dîwarê Ke’bê de dihatin daleqandin. Mêrkujî û şer wek çandeke bilind û heskirî di nava Erebên wê demê de dihatin dîtin. Ola Islamê bi rêveberiya Pêxember (silavên Xwedê li bin) dij vê çandê têkoşîn da û bi ser ket. Xwînrêjî wek gunehê herî mezin pênase kir. Li bajarê Medînê şerê sedsalan yê navxweyî qedand, yekitî û wekhevî ava kir. Di axeftinên xwe yên Hecca Xatirxwestinêde kuştin, destdirêjiya mal û neheqî heram kirin. Piştî wefata pêxember. Careke din Islam wek desthilat hat bikaranîn û projeya Xwedê yê Aştiyê hêdî hêdî vegeriya projeya dagîrkirin, şer û talanê. Malbata Ebû Sufyan desthelatî kir destê xwe û Islam ji çavkaniya wê ya bingehî hat durxistin.

Oleke din lê bi nav ISLAM hat avakirin û çanda berê ya kuştin û tinekirinê ya serdema cahiliyê, bi navê Ola Islamê hat pêşxistin. Malbata Pêxember bi navê Ola Islamê qir kirin û ew roj ev roj e bi navê ola ku wateya wê Aşitî ye, qirkirin û dagîrkirin tê pêşxistin. Ecêba giran ev e, nav ola AŞTÎ ye lê alîgirên vê olê sirf kuştinê dikin. Islam projeya Aştiyê ye, lê di ser hezar salî re ye Misilman hev û xelkê dikujin. Divê Misilmanên durist ji bo aştiya navxweyî û aşitiya giştî kar bikin. Misilman nakujere, aştîxwaz e û divê ji bo aştiyeke birûmet têbikaşe.

Dema me Misilmanan wateya Ola xwe fêm kir, wê aştî di nava me û cîhanê de jî pêş bikeve.

# Çîroka Cûdî û giyayê sebrê...hevaltî ye ne ji bo firotinê ye

**Xalid Etê/Qamişlo**

**Bi heskirina xwezayê re, Cûdî dest bi rêwîtiya komkirina giyayê sebrê dike. Dibêje, min heskirineke bêhempa bi giyayê sebrê re dît. Ji ber wê hevatiya min bi wan re çêbû. Lê ev hevaltî jî ne ji bo firotinê ye.**

**Hevaltiya bi giyayê sebrê re…**

Cûdî Hesen (27) ji bajarê Qamişlo ye û endezyarê petrolê ye. Niha di şaneşîna mala xwe de giyayê sebrê xwedî dike. Li ser heskirina xwe ya giyayê sebrê, ji me re wiha axivî: “Berî çar salan dema min li zanîngeha Humisê dixwend, heskirina min ya giyayê sebrê çêbû. Jixwe ji destpêkê ve ez girêdayî xwezayê bûm. Em bêjin çima giyayê sebrê? Giyeyeke her tim şîn e û ji aliyê teşeya xwe ve jî xwediya bedewiyeke bêhempa ye. Herwisa kulîlkên wê jî pir bedew in. Ya din ku navê xwe jî jê girtiye `Sebir`, ev jî taybetiyeke ku dihêle mirov jê hes bike. Dema di nava wan de bim, enerjiya min ya neyînî namîne û hêzeke erênî dide min û di navê de mest dibim. Ya rast heskirineke dualî ye.

**`220 giyayên sebrê li cem min in û hê wan kom dikim`**

Cûdî komkirina giyayê sebrê li Humsê bi tayekê dest pê dike û niha nêzî 220 jê bi 150 cureyî xwedî dike. Ji bilî komkirina û kirîna vî giyayî, bixwe wan fitrûm dike û ev agahî bi me re parve kirin: “Ez weke ruh li wan dinêrim û weke hevalên min in. Ji bo wê ne ji bo bazirganiyê wan xwedî dikim. Lê dibe ku wan biguherînim. Ango ji bo anîna cureyên din dibe ku wan bifiroşim. Jixwe ji bo komkirin û pirkirina vê komê dixebitim. Lewra li cîhanê 25.000 hezar cureyên vî giyayê hene. Ez hewl didim gelekan ji wan kom bikim. Lê derfetên aborî û ji bo xwedîkirina wan ciyê guncaw jî dibin asteng.”

**`Şînkayiyê belav bikin`**



Cûdî, bi rûgeşî û heskirineke bêhempa, di heman demê xemgîniya li ser rûyê xwe axaftina xwe wiha qedand: “Ez dikarim vê bêjim; em û bajarên me ji her tiştî pirtir, pêwîstiya me bi şîntayiyê heye. Mixabin çanda çandiniyê di hişmendiya piraniya me de genim, ce û hwd e. Ev hişmendiyeke şaş e. Hêvî dikim ku li her derê şînkayî û dar bên çandin û li xwezayê xwedî derkevin û biparêzin



# HPG: Ji bo tolhildana komkujiya Zaxoyê çalakî hatin lidarxistin

Gerîlayên Azadiya Kurdistanê ji bo tolhildana komkujiya ku dewleta Tirk a dagirker li Zaxo pêk anîbû çalakî li dar xistin. Di çalakiyan de 4 dagirker hatin cezakirin, 2 çeper, dronek û kamerayek mobesse hatin rûxandin, wesayîtek zirxî jî hate derbkirin.

**Navenda Nûçeyan**

Dewleta tirkî ya dagîrker di 20’ê Tîrmehê de li gundê Perex ya Zaxoyê geştiyarên Iraqî bombebaran kiribû. Di bombebaranê de tevlî pitikekî yek salî 9 kesan jiyana xwe ji dest dan û 23 kes jî birîndar bûbûn.

Li bajarên Iraq, Kurdistan û Tirkiyeyê li hember komkujiya dewleta tirkî bertekên gel çêbûn û hat şemzarkirin, herwiha çalekiyên li dijî vê komkujiyê didomin. Lê PDK’ê bi tevahiya rêbazan hewl dide ku sûcên komkujiya li Zaxo li ser Tirkiyê rake, ji bo wê Mesrûr Berzanî serdana Bexdad kir û bi rayedarên Iraqî hevdîtin pêk anîn. Lê belê li hember vê komkujiyê HPG’ê carekê din ispatkir ku ew hêza parastina gelan e û li dijî her cûre dagirkerî û qirkirinê xwedî helwest e.

Ji bo rakirina tola welatiyên ku di komkujiya Zaxo de canê xewe ji dest dan, Hêzên Parastina Gel (HPG)’ê çalakiyek li dijî dagîrkeriya tirkî pêk anîn.



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê çalakî wiha ragihand: “Gerîlayê Azadiya Kurdistanê, têkoşîna xwe ya destanî ya ku bûye hêviya hemû gelên bindest didomîne. Hêzên me yên gerîla li ser navê biratiya gelan ji bo tolhildana 9 mirovên bêguneh ên li Zaxo ji aliyê dewleta Tirk a qirker ve hatin qetilkirin, rêze çalakî lidar xistin. Di encama van çalakiyên tîmên me yên bi tevger de; Herî kêm 4 dagirker hatin cezakirin, dagirkerek birîndar bû, 2 çeper, 1 dron û 1 pergalek a kameraya mobesse hatin rûxandin û wesayîtek zirxî hate derbkirin.

Tawanbarê şer artêşa Tirk ku nikare berxwedana hêzên me bişkîne, 5 caran bi çekên kîmyewî û teqemeniyan, 11 caran bi balafirên şer, 33 caran bi helîkopterên êrîşê, bi dehan caran jî çekên giran, obus û hawanan çeperên şer ên li Qadên Berxwedanê, bombe kirin.

Artêşa Tirk a ku bi her cure teknîka şer û çekên qedexekirî yên kîmyewî êrîşî hevalên me yên li çeper û tunelan kir, ti encam negirt û vê carê jî bi wesayîtên zirxî û kepçeyan êrîşî çeperên berxwedanê kir. Lê artêşa Tirk a dagirker çi teknîkê bikar bîne jî, wê ti carî nikaribe ruh û îradeya fedayî ya Apoyî bişkîne.”

# Di êrîşên dagîrkeriyê de lawir jî tên kuştin

**Bijîşk Firat Riha diyar kir dema ku dewleta Tirkan ku xwezaya Kurdistanê bombebaran dike, di bombebaranê de gelek heywan jî tên kuştin û bang li heywanhezan kir ku helwestê nîşanî vê rewşê bidin.**

Li çiyayên Kurdistanê gelek heywan hene. Yek ji van heywanan jî pezkovî ne. Dewleta Tirk jî Herêmên Parastinê yên Medyayê di serî de çiyayên Kurdistanê bênavber bomberdûman dike. Ji ber vê bomberdûmanê gelek heywan jî tên qetilkirin. Di van êrîşên dewleta Tirk de jî gelek pezkovî hatine qetilkirin.

Firat Riha yê ku li Herêmên Parastinê yên Medyayê bijîşkiyê dike, heta niha gelek pezkoviyên birîndar jî tedawî kiriye. Firat Riha diyar kir ku dewleta Tirk çiyayên Kurdistanê talan dike û got “Dewleta Tirk dema ku êrîşî Herêmên Parastinê yên Medyayê dike ev êrîş ne bi tenê li dijî gerîla û gelê sivîl e. Ev êrîş li dijî hemû zindiyan e. Gelek caran di medyayê de jî derket holê dewleta Tirk heywanan jî qetil dike. Hemû zindî li çiyayên



Kurdistanê dibin hedefa van êrîşên hovane. Vê pezkoviya di hembêza min de jî di êrîşa dewleta Tirk de birîndar bû. Piştî bomberdûmanê hevalan vê pezkoviya birîndar dîtin û anîn ji min re. Em ne bi tenê mirovan hemû zindiyan tedawî dikin. Serê pezkoviyê birîndar bûbû û pêyê wê şikestibû. Piştî tedawiyê em ê wê berdin.”

Firat Riha bal kişand ser êrîşên ku dewleta Tirk li ser xwezaya Kurdistanê dike û bang li heywanhez û xwezahezan kir. Riha got “Divê xwezahez û heywanhez li hemberî van êrîşên dewleta Tirk helwestê nîşan bidin. Dewleta Tirk ji aliyekî ve daran dibire û ji aliyê din ve jî heywanan dikuje û xwezaya Kurdistanê qir dike. Li hemberî van tiştan deng ji tu kesî dernakeve. Kesên ji xwe re dibêjin ez mirov im, ez xweza û heywanan diparêzim divê li hemberî vê hovîtiyê dengê xwe bilind bike.”

***ANF***

# Li Idlibê revandina jinan zêde bûye û sûcdar bê ceza dimînin

**Zêdebûna bûyerên revandin û windakirina jinên di temenê cuda de li deverên curbecur ên Idlibê, bûye sedem ku jin her dem di nava tirs û bêewlehiyê de bijîn.**

Idlib her roj dibe şahidê bûyerên revandin û windakirina jinan. Ji ber adet û kevneşopiyên civakî, windabûna jin û keçan kêm caran tê ragihandin. Zêdebûna bûyerên revandin û windakirina jinên di temenê cuda de li deverên curbecur ên Idlibê, bûye sedem ku jin di nava tirs û bêewlehiyê de bijîn.

**Bê şûn winda dibin**

Di 14’ê Tîrmehê de, Semer Mehmûd El-Xetîb a 16 salî ku li bajarê Dana dijî, dema li gel kurê xwe yê neh mehî diçû seyrangeha bajêr winda bû, heta niha agahî der barê wan de tune ye û kes nizane çi hatiye serê wan. Di 25’ê Nîsana borî de, xwendekara zanîngehê Rena El-Birû ya 23 salî dema ku ji zanîngeha Idlibê vedigeriya winda bû, heya niha çarenûsa wê ne diyar e. Dayika wê, Lemîa El-Elî



ya 40 salî got ku keça wê sala sêyemîn li zanîngeha Idlibê, beşa wêjeya Drebî, dixwîne û wiha pê de çû: “Dema ku keça min ji zanîngehê vedigeriya malê pêwendiya me pê re qut bû, hê tu agahî jê tune ye. Me windabûna keça xwe ji navenda ewlehiyê re ragihand lê heta îro encamên erênî derneketine.”

**Ji bo fîdyeyê hatin revandin**

Di 5’ê Adara 2022’an de, her du keçên temenê wan biçûk Rîma û Seba dema ku diçûn navenda kursên xwendinê li bajarê Dana, li bakurê Idlibê, winda bûn. Windabûna wan zêdetirî du mehan berdewam kir, heya ku polîsên leşkerî li bajarê Babê dikaribûn tawankaran bigrin. Hat eşkerekirin ku wan her du keç revandibûn da ku fîdye ji malbatên wan bixwazin. Dayika Seba, Merwa El-Hisên a 42 dibêje ku kesên tawanbar bi hevjînê wê re nakokiyek wan a şexsî hebûye û ji bo fîdyeyê her du keç revandine. Malbatê ji ber şermê nexwest windabûna her du keçan ragihîne.

**Her diçe hejmara kesên winda dibin zêde dibe**

Li gorî Ofîsa Karûbarên Birîndar û Windayan, bi derbasbûna demê re hejmara windayên ku hatine tomarkirin gelekî zêde dibe û yên herî zêde tên windakirin û revandin jî jin in.

***JİNHA/Idlib***

# 'Hêzên navneteweyî li ser xwîna gelan bazarê dikin'

Roşîn Mûsa diyar kir ku ji bo têkbirina dagîrkeriyê amade ne û got, dewleta tirkî li ser ewleyiya Rojhilata Navî xeter e. Baweriya me bi hêza me heye ku dagîrkeriyê têk bibin. Derveyî hêza me wê ti hêz me neparêzin.

**Mihemed Xanim / Qamişlo**

Ji destpêka şoreşa Rojava ve dewleta tirkî ya dagîrker bi riya çeteyên El Qaîde û DAIŞ'ê êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Piştî têkçûna DAIŞ'ê li bakur û rojhilatê Sûriyê, Tirkiye bixwe êriş dike. Dewleta tirkî û çeteyên wê di dema êrişên dagîrkeriyê yên li Serê Kaniyê, Girê Spî û Efrînê de, li dijî sivîlan bi dehan komkujî kirin. Niha jî êrişî sazî û rêxistinên Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, meclisên leşkerî, nexweşxane, şaredarî û hwd dike. Li hemberî komkujiyên li ser welatiyan bêdengiya civata navneteweyî dewam dike. Li ser gef û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên Rêvberiya Xweser, Endama Meclisa Giştî ya Pratiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Roşîn Mûsa ji me re axivî.

### Bêdengî û durûtiya hêzên navnetewî

Roşîn Mûsa diyar kir ku ji despêka şoreşa Rojava ve dewleta tirkî dixwaze îradeya gelên herêmê bişkîne. Herwiha da zanîn ku hêzên navneteweyî jî bi bêdengiya xwe alîkarên vê dagîrkeriyê ne û axiftina xwe wiha domand: "Destpêkê em bejna xwe li hemberî şehîdên azadiyê ditewînin. Ji bo şehîdbûna Fermandar Jiyan Tolhildan em sersaxiyê ji Hêzên Sûriya Demokratîk , gelên bakur û rojhilatê Sûriyê û tevayiya azadîxwazên cîhanê re dixwazin. Êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ne nû ne, lê her dem şêwazên êrişên xwe diguherîne. Ev demek e ku bi balafirên bêmirov êrişî bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Bi balafirên bêmirov êrişî welatî, kesayetên welatperwer û berxwedêrên Rojava dike. Li hemberî van kiriyarên nemirovî hêzên navneteweyî bêdeng in û em vê bêdengiya wan şermezar dikin."

### 'Rûsya, Îran û Tirkiyê ji bo têkbirina vîna azad li hev kirine'

Roşîn bal kişand ser civînên di navbera Rûsya , Îran û dewleta tirkî yên derbarê êrişên Tirkan yên ser herêmê û wiha got: "Dibe ku Rûsya û Îranê di civîna li Tehranê de, êrişeke nû ya Tirkiyê erê kiribin, lê dagîrkerî li gorî demê xwe amade dike û dibe ku dest bi êrişeke berfireh bike."

### 'Hêzên navneteweyî ji bo berjewendiyên xwe li ser xwîna gelan bazarê dikin'

Roşîn da xuyakirin ku hêzên navneteweyî ji bo berjewendiyên xwe yên aborî çavê xwe digirin û li hemberî kiryarên Tirkiyê xwe bêdeng dikin. Wiha dirêjî da axaftina xwe: " Dewleta tirkî ya faîst di heftiyekê de çend komkujî kirin. Li Zaxo êrişî welatiyên Iraqî kir û gelek ji wan mirin. Herwiha êrişî fermandarên YPJ'ê kir û di encamê de sê hevalên YPJ'ê şehîd bûn. Li Zirganê ya girêdayî bajarê Til Temer êrişeke hovane kir û di encamê de hin welatî şehîd û birîndar bûn. Tevî ku dagîrkerî ketûber êrişî welatiyan dike, Rûsya û Amerîka ji bo berjewendiyên xwe bêdeng **dimînin. Hêzên navneteweyî ji bo berjewendiyên xwe kar dikin û li ser xwîna gelan bazarê dikin** û ji bo parastina berjewendiyên xwe gelan dikin qurban. "

### 'Wê rêxstinbûna gelên herêmê û baweriya wan, şkandina dagîrkeriyê teqez bike'



Endama Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Roşîn Mûsa, bang li gelên herêmê kir ku li gorî Şerê Gel yê Şoreşgerî bixebitin û axaftina xwe wiha qedand: "Ji gelên herêmê tê xwestin ku xwe birêxistin bikin û piştgiriya hêzên xwe yên leşkerî bikin. Li ser bingehê Şerê Gel yê Şoreşgerî, xwe ji êrişên demdirêj re amade bikin. Ji her kesî tê xwestin ku li gorî erkê demê tev bigere û tevlî berxwedana gelan bibe. Herwiha ji bilî jiyaneke azad ti tiştî qebûl nekin. Di warê têkiliyên derve de jî, pêwîst e Rêveberiya Xweser têkiliyên xwe yên dîblomasî bi kesayetên xwedîbandor û saziyên mafên mirovan yên cîhanê re xurt bikin, êrişên Tirkiyê û kiryarên wê yên hovane ji raya giştî re eşkere bikin. Lewra di vê qonaxê de rola hiqûqzan û saziyên civaka sivîl di eşkerekirina komkujiyên Tirkiyê de, pir girîng e."

## Doza Kobanê: Parastin hatin astengkirin, êrîşî girtiyan hate kirin

**Di Doza Kûmpasê ya Kobanê de parastina siyasetmedarên Kurd hate astengkirin. Polîsan piştre êrîşî parêzer û siyasetmedaran kir.**

Rûniştina dozê li Dadgeha Cezayê Giran a 22'emîn a Enqereyê hatekirin. Heyeta dadgehê xwest parastinan asteng bike û bang li polîsan kir ku bila were eywanê. Di dema êrîşê de siyasetmedar Nazmîr Gur xeriqî.

Di destpêka rûniştinê de heyeta dadgehê ewraqên ji bo dosyeya dozê nexwend û dest bi parastinan kir. Siyasetmedar û parêzeran îtîrazî vî tiştî kirin lê heyeta dadgehê biryara xwe neguherand û mafê axaftinê neda parêzeran. Siyasetmedar Sebahat Tûncel di rûniştinê de diyar kir ku heyeta dadgehê krîzê çêdike. Heyeta dadgehê gotina Tûncel birî û nehişt ku Tûncel parastina xwe pêşkêş bike.

Heyetê piştre mafê axaftinê da siyasetmedara girtî Gulten Kişanak. Kişanak diyar kir ku Tûncel li ser kursiyê ye û heta ku Tûncel parastina xwe neke ew ê jî neke.

Heyeta dadgehê gotina Kişanak jî birî û mafê axaftinê da Hevseroka Giştî ya berê HDP'ê Fîgen Yuksekdag. Yuksekdag jî got "Dadgeh him parastinan asteng dike û him jî dipirse hûn ê parastinan bikin an na."



Parlementera berê ya HDP'ê Gulser Yildirim jî diyar kir vê helwesta li hemberî wan ne hiqûqî û ne jî mirovî ye.

### Plîsan êriş kirin

Dema ku ewraqên ji bo rûniştinê hate xwendin siyasetmedar û parêzeran bi çepikan heyeta dadgehê protesto kirin. Heyeta dadgehê jî ji bo êrîşê bangî polîsan kir. Polîsan êrîşî parêzer û girtiyan kir. Di êrîşê de siyasetmedarê girtî Nazmû Gur xeriqî û tîmên tendirustiyê bi wî re eleqedar bûn.

***ANF***

## Nikarin rastiyê berûvajî bikin



**Dilyar Cizîrî**

Dewleta tirkî ya dagîrker ku ji 17'ê Nîsanê ve bi tevayiya hêza xwe êrişî herêmên gêrîla dike, rastî berxwedaneke mezin ya gêrîla tê. Ji ber wê ji bo reşkirina tevgera azadiyê û hêzên gêrîla serî li gelek rê û rêbazan dide. Bûyera topbarana gundê Perxê yê Zaxo jî di vê çarçoveyê de hatiye kirin. Armanca dewleta tirkî ji topbarana wê herêmê, di serî de ew bû ku herêmê ji sivîlan vala bike û çemberê li gêrîla teng bike. Ya din jî dixwaze kuştina sivîlan bixe stûyê gêrîla û ji raya giştî re bêje, binêrin "PKK sivîlan dikuje".

Lê tişta hesabê wan serûbin kirî, ew bû ku kesên çûyîn wir geştê û bûyîn qurban ji başûrê Iraqê bûn. Wan texmîn dikir kesên li wir hemû Kurdên Başûr in. Jixwe rojane li Başûr, Rojava û Bakur Kurdan dikujin û ti kes dengê xwe nade.

Li başûrê Kurdistanê tenê di çend salên dawî de nêzî 150 welatiyên sivîl di êrişên dewleta tirkî de şehîd bûne. Balkêş e dema di êrişên dewleta tirkî de tên kuştin ne hêzên navdewletî ne jî hikûmeta Iraqê û gelê Iraqê dengê xwe dike.

Lê ji ber ku yên di êrişa gundê Perxê de hatîn kuştin Erebên ji başûrê Iraqê bûn, em dinêrin di asta herî jor de li Iraqê nerazîbûn derketin. Di heman demê de civaka Iraqê li dijî dewleta tirkî rabû ser piyan. Ev helwesteke erênî ye. Heta niha dewleta tirkî gelek tengav kiriye. Divê civaka Iraqê vê helwesta xwe bidomîne û hê xurttir bi ser de biçe.

Lê mixabin pirsa li vir xwe dide der, çima heta niha gelê başûrê Kurdistanê li dijî êriş û komkujiyê nikare bibe xwedîhelwest. Ji bo bersiva vê pirsê, di van çend rojên komkujiya gundê Perxê ya Zaxo em dinêrin çawa rayedarên PDK'ê û saziyên wê yên ragihandinê ji bo dewleta tirkî bêsûc nîşan bidin û komkujiyê bixin stûyê PKK'ê di nava tevgerê de ne.

Ev tevgera PDK'ê bi dewleta tirkî re pêk hat. Hema piştî komkujiyê ji bo pêkanîna plana xwe bi her awayî di nava hewldanan de ye komkujiyê bixe stûyê gêrîlayên azadiyê. Ji bo wê em dinêrin saziyên xwe yên ragihandinê û alavên xwe tev ji bo vê xistine dewrê. Heman tiştî PDK jî dike. Ji bo dewleta tirkî bêsûc nîşan bide û PKK'ê ji komkujiyê berpirsyar nîşan bide. Ragihandina PDK'ê bi her awayî dixwaze vê xizmetê ji dewleta tirkî re bike. Saziyên wan yên ragihandinê bi tevayiya hêza xwe dest bi propagandayê kirine.

Di heman demê de rayedarên wan dibin mêvanên saziyên ragihandinê yên derve û wek alîgirên dewleta tirkî parastinê dikin. Lê tişta balkêş, her çendî dewleta tirkî bi riya alîgir û saziyên girêdayî xwe dixwaze komkujiyê bixe stûyê gêrîlayên HPG'ê, heta niha nikarîne rastiya ku komkujiya Perexê dewleta tirkî kiriye, li gel civak û hikûmeta Iraqê berûvajî bikin. Di vê derbarê de jî me dît PDK'aya ewqas parastina dewleta tirkî dike û dixwaze rastiyan berûvajî bike, di qada Iraqê de têkçûna xwe xurttir dike.



# Dewleta Tirk Ya Dagirker Mesrur Barzani Erkdar Kir!

Li gor agahiyên ku ajansa rojnews dest xistîn, Serokê hikûmeta Herêma başurê Kurdistanê Mesrûr Barzanî bi armanca kêmkirina nerazîbûnên Iraqê li dijî dewleta Tirk û her wiha ji bo lihevkirinek veşarti, li ser daxwaza dewleta Tirk serdana Bexda'yê kiriye.

**Navenda Nûçeyan**

Li gorî çavkaniyeke siyasî ya Iraqê ku rojnamevanê rojnews dest xistî, hat diyarkirin ku armanca serdana ji nişka ve ya Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî ya ji bo Bexda'yê gotûbêjkirina komkujiya dewleta Tirk a li Zaxo'yê û kêmkirina nerazîbûnên li dijî artêşa Tirk bûye.

Herwiha li gorî van agahiyan, Mesrûr Barzanî li ser daxwaza rayedarên dewleta Tirk serdana Bexda kiriye û rola qasidiyê lîstiye.

### Mesrur Barzani Bi Bexda'yê Re Bazara Çi Kir ?

Li gorî çavkaniyên heyî dewleta Tirk bi rêya Mesrûr Barzanî peyam gihandiye rayedarên Iraqî û ji wan re gotiye, 'Eger ew biryarên tund ên li dijî dewleta Tirk nedin û gavên dijberê Tirkiye ku bixin tengaviyê ne avêjin, dewleta Tirk amadeye tazmînatê bide malbatan!' Her wiha hate zanîn ku Iraq weke helwestek dijî dagirkeriya Tirk dixwaze deriyê sînor yê Îbrahîm Xelîl bigire, lewma Barzanî ji bo boykot li dijî Tirkiye çênebe û derî neyê girtin jî daxwaz ji Iraqê kiriye ku, pêngaveke bi vî awayî ne avêjin.


Lê ne hate zanîn, ka rayedarên Iraqê razîbûne vê mijarê li gel Barzanî gotûbêj bikin an na û her wiha bersiva wan jî ne hate zanîn.

### Bi Raporên Fermi Komkuji Hat İspatkirin Lewra Bazarên Veşarti Destpê Kir

Hêjayi gotinêye kû piştî 20'ê mehê li Zaxo buyera kû pêk hatibu, ji aliyê heyetên fermi ya hukûmeta Iraq'ê hatibu keşfkirin ku komkuji aliyê dewleta dagirker ya tirk hatiye çêkirin, ruxmê vê heta aniha dewleta tirk ya dagirker dixwaze sucên xwe yê şer veşêre.

Dewleta tirk ya dagirker çend rojên destpêkê hewl da sucên xwe bavêje ser hereketa azadiyê lê bi raporên fermi hatê ispatkirin ku komkuji ji aliyê dewleta tirk ya dagirker hatiye kirin. Pişti ku bi raporên fermi hat ispat kirin ji bo encamê komkujiyê bê sivikkirin bi qasidiyê Mesur Barzani bazareke veşarti dixaze bimeşine.

### Çapemeniya PDK'ê Weke Hevditinek Rutin Nişanda



Hêjayî gotinê ye, malpera Spûtnîk ya beşa Erebî jî agahiyek bi heman şêweyî îro derbas kir.

Li gorî çapemeniya PDK'ê Mesrûr Barzanî û şandeya pêre ji bo gotûbêjkirina pirsgirêkên navbera Herêma Kurdistanê û Iraqê de serdana Bexda'yê kiriye. Li gorî ragihandina Mesrûr Barzanî li gel Serokwezîrê Iraqê Kazimî û gelek rayedarên Iraqê re hevdîtin pêkaniye.

20'ê Tîrmehê dewleta Tirk da dagirkirin ku bi zanabûn geştiyarên Ereb yên li Zaxo'yê kir hedef. Di encama topbarana dewleta Tirk de 9 geştiyar jiyana xwe ji dest dan û 23 kes jî birîndarbûn. Piştî komkujiyê li seranserê ıraqê xwepêşandan û nerazîbûn çêbûn. Gelek navendên serlêdana Vîzeyê yên Tirk li Iraqê hatin girtin. Iraq'ê biryar da ku balyozê xwe yê Tirkiye bikişîne. Her wiha biryara boykotkirina malê Tirkî li sernaserê Iraqê belav bû.

***Çavkanî:Rojnews***

## Jiyan, Roj, Baharîn û Azadî



**Zekî BEDRAN**

Xirabiya dewleta tirkî dewam dike. Dixebite ku her tişta bedew tine bike. Dema bibe mijara Kurdan zimanê wê tev li ser şidet, tinekirin û bêbandorkirinê ye. Dijminiyeke kûr û bîsînor dike.

Nava rojê li Zaxo bombeyan dişine nava koma çûyî seyranê. Piranî zarok, 9 kes hatin kuştin û 20 birîndar bûn. Piştî ku nikarî komkujiyê veşêre serî li inkarê da. Qaşo dewleta tirkî li dijî lêxistina zarokan e. Ma ew bombe ji ezmanan hatin? Di deste gerîla de topên wisa nînin. Li wir şer jî nîne. Herwisa gerîla jî li wir nîne.

Dewleta tirkî ya faşîst sê jinên şoreşger yên rêbertî ji şerê li dijî DAIŞ`ê şer kirîn, 23'yê Tîrmehê de şehît xistin. Jiyan Tolhildan, Roj û Baharîn, vexwendiyên Foruma Jinan bûn. Ev jinên pêşeng piştî derketina ji civînê bi SÎHA hatin amanc kirin.

Navên van jinên şoreşger bixwe di mirovan de hestên bedew şiyar dikin. Lê ji ber ku ev faşist dijminê her tişte bedew in, li şûna jiyandinê dikuje. Ji ber ku kuştinê huner dizanin agahiya kuştinê bi iftixar didin. Faşîstê Erdogan ve Bahçeli `lehengiyeke` hêjayî ecdadên xwe dikin.

Di temenê piçûk de Jian li dû her tişta bedew ket. Xebitî her tişta insanî li cem xwe kom bike. Li hemberî her tişta neheq û qirêj rawestiya. Ji bo wê bû xwediya rûhekî bilind. Riya wê û ya Apoyiyên derketîn beza azadiyê rastî hev hat. Bêduludî tevlî wan bû û bû ya herî bedew. Li hemberî her zor û zehmetiyê şer kir. Fêm kir, zane bû. Her ku zane bû, bû îrade. Her ku bû îrade keseyateke ku bin nakeve bi dest xist.

Hêzên serdest dixwazin civakê bêrêxistin û belawela, bêçand bikin. Lê Jiyan bi rûhekî xurt û bi taybetiyên bilind yên insanî riya xwe domand. Neket davikên pergalê û qirêjiya wê. Bi awayekî ku layiqî şoreşgerekê be jiya û bi ser ket.

Li herêmeke weke Rojhilata Navî ku jinek di temenekî piçûk de bibe xwedîîrade ne hêsan e. Jiyan di her qonaxa şoreşa Rojava û şer de li pêşiyê bû. Hevaltî û paqijî bi rûhekî xurt layîqî xwe dît. Artêja Iraq û Sûriyê ji pêşiya çeteyên DAIş`ê direviyan. Lê jinek bi ser hêzên paşverû de çû. Di asta wêrekî û fedayîtiya herî bilind de bû xwediya tevlîbûnê. Bû rûyê bironahî yê Kurdistanê jinên şoreşger. Neket, newestiya, bêbawerî pê re çênebû. Tinebûn û zehmetî li pêşiya wê nebûn asteng. Lewra kesayeta xwe saxlem ava kiribû. Di avakirina YPJ`ê de û di rêxistinkirina jinan de bi pêşengî ciyê xwe girt.

Dildara azadiyê bû. Di cewher, gotin, pratîk û jiyana xwe de bênakokî bû. Bedewiya hundirê wê li rûyê wê jî dabû. Di nava civakîbûnê de heliyabû. Bi zanebûna ku ayidê gel û şoreşê ye dijiya. Ne Rojava tene milîtaneke pêşeng ya seranserê Kurdistanê û Rojhilata Navî bû. Ji bo ku YPJ bê birêxistinkirin, bibe xwedînasname û din ava jinên dinyayê de ciyê xwe bigire û bibe çavkaniya baweriyê ji ti xebat û fedakariyê xwe neda paş. Di nava şer û krîzê de ku bi şerê cîhanê yê sisiyan tê pênasekirin de, ji bo nîşanddana îradeya şerkirin û mayîna li ser piyan pêdivî bi kesayetên xurt heye. Li devereke weke Sûriyê ku hêzên weke Amerîk, koalisyon, Îran, Rûsya û Tirkiye lê bi cî bûne, şerkirin û mana li ser piyan çawa ku tê texmînkirin ne karekî hêsan e. Berî her tiştî pêdivî bi hizrekî xurt, bawerî û kesayetê heye. Di xwespartina hêza cewherî, birêxistinbûn û bûna hêzê de pêdivî bi serkeftinê heye. Jiyan div an astengî û zehmetiyan de derbas bû, pêşengî ji jinan û kesên diperçiqin re kir û kesayeteke şoreşger bi dest xist. Çawa me gotî dewleta tirkî bûye navenda xirabiyê. Ji bo fetisandina Rojava bi hêzên weke DAI, El Nusra re itîfaq kir. Piştî ku bi wan û bi planên tarî û qirêj nikarî bigihe encamê, bi artêşa xwe ket Sûriyê. Li herêmên dagîr kirin li hemberî Kurdan dest bi qirkirina neteweyî kir. Bi destê çeteyên xwe destdirêjiya li jinan jî di navê de xirabiya nekirîn nema. Faşîstên Tirk çima Jiyan û hevalên wê dikujin? Jiyan bi nirxên mirovayiyê ve girêdayî bû. Li Sûriyê sirf li hemberî DAIş`ê şer kiribû û gelê xwe parastibû. Dewleta tirkî ketiye pey kesên li dijî DAIş`ê şer kirin û ji bo tinekirina wan serî li her rêbazê dide. Yên dibêjin em li dijî DAIş`ê şer dikin ew jî temaşe dikin. Kesên bawer dikin ku wê başî li hemberî xirabiyê bi ser bikeve, em ji wan in. Jiyan û hevalên xwe li dû tiştên baş û bedew bûn. Eger hin bi kuştina zede bilind bibûna, wê niha Hîtler di mertebeya herî bilind de buya. Yên weke Erdogan ku di riya Hîtler de dimeşin, wê piçûk, rezil û riswa bibin. Wê Jiyan û yên weke wê her tim li bilindiyan û ciyên pîroz bin.